

Bidestveanîna Mafên
Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya
Îranek Demokratîk û
Federal De

Hejmar: 178
05'ê Adar 2012
Buha: 150 Tûmen

Agirî

Hevdîtinên birêz "Mistefa
Hicrî" li welatê Birîtanyayê
berdewam in



Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdî

Baykot!



Kurdistaniyan baykot hilbijartin



Xelkê Kurdistanê di piraniya gund û bajarên de, bi baykot kirina şanoya hilbijartinên Parlamentoya Komara Îslamî, bersivê erênî dane partiyên kurdistanî û pêşwazî ji daxwaza wan kirin. Baykote hilbijartinê ji aliyê xelkê Kurdistanê ve di demekê de bû ku rejîmê bona beşdarkirina xelkê din hilbijartinê de ji tu darêtinê cure pîlanan xemsaî nekir. PDKÎ û Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê, di daxûyaniyê hevpar de, sipas û hurmeta xwe ji vê kiriyara şoreşgêrane ya xelkê azadîxwazê Kurdistanê re şand.

Sergotar

Ceribînek serketî û şikestek dîrokî

Selîm Zencîrî

Serencam maşkanêya 12'ê Reşemeyê birêve çû. Rojek ku ji bo du aliyên rejîm û Opozîsyona wê derfetek baş bû bona nîşandana hêz û hejmûnê û rewatiya xwe, lewma jî ketin rikeberiyek bêhembar de bo serketinê.

Ya girîng ji rejîmê re ew bû ku refên dûr û dirêj ên xelkê nîşanî bîr û raya giştî bide û xwe ji van kirîzên siyasî û rewatiyê li vê qonaxa hestiyar de rizgar bike. Elheq bo rakişandina xelkê bo ser sindoqên dengdanê ya ku ji destê wan hat encam dan, vêca çî bi taktîk û pîlan bin yan çavsofî û temah be. Bêguman jî karî tîra manorên siyasî hejmarek ji xelkê bi her awayekê û bi neçarî rakişîne ser sindoqan û bike xoreka piropagendeyên xwe. Nexa encam û "pêşbîniya îlahî û şîbî muicizeya Welîyê Feqîh" maşala her wekî hev û gorî pîlanrêjîyê derçûn!!

Eniya hember jî opozîsyon bû ku vê carê bi awayek bêminak yekdeng û yekhelwest maşkanê baykot kirin û bi kêmtirîn îmkanat daxwaz ji xelkê kirin ku beşdarî vê şanogeriye nebin; helbet piştqahîm û bawermend bi cesûrî, îradeya polayîn û morala endam û alîgirên xwe û azadîxwaz û hemû çewsandiyên Îranê, birryarek wiha girtin û karî bi piştewaniya xelkê rûsipî li vê ceribîn û rikeberiyê de derkevin û bi vê pêla bihêze baykotê, rewatî û rûçikê nemirovane û dîktatorane yê rejîmê jî pêtir ji her demekê bibine jêr pirsiyarê. Ceribînek ku berevajî îdeyên rejîmê, pirr serkevtî û şikestek mezin û dîrokî bû ji rejîmê û kirêgirtiyên wê re. Şikestek ku nuqte guherînek mezin e di arasteya pêşvebirin û bihêzbûna xebata demokrasîxwazî û dijî serberedatiya gelên Îranê.

Kirîz û alozî afirandin
bi rêya terorê

R: 4

Destêwerdan di nav
karûbarên Sûriyê de

R: 6

Ji bo jinên Kurd di
8'ê Adarê de

R: 8

Spasnameya hevpar a
PDKÎ û Komeleya Şoreşgêr a
Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê, derheq
baykote maşkanêya hilbijartinê

R: 2

Spasnameya hevpar

PDKÎ û Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistanana Îranê, derheq baykota maşkanêya binav hilbijartinên Meclîsa nehem spasnameyek pêşkêşî xelkê Kurdistanê kirin

Deqa sopasnameyê:

Hewwelatîyên berêz!

Xelkê xebatkar û berxwederên kurdistanê!

Dema PDK Îranê û Komeleya Şoreşgêr a zehmetkêşên Kurdistanana Îranê di daxuyaniyeke hevpar de, hilbijartina gera nehê a meclîsa Îranê baykot kirin û daxwaz ji xelkê kurdistanê kirin ku di vê şanogeriye de beşdariyê nekin, piştqahîm bûn bi pêşwazî kirina xelkê canfîda, azadîxwaz û xortên netewa kurd di hemû bajar û gundên Kurdistanê; herweha çavniheriya di piraktîk nîşandana wê xatircemiyê bûn ku di roja xwe de wê "Na" yê bibêjine Komara Îslamî û bersiva erênî bidin daxwaza han.

Roja Înê, 12'ê Reşema sala 1390'a Rojî, wate roja birêveçûna şanogeriye, serbarê ew hemû pîlan û gef û handanên rejîm û derûdesteyên wê, hûn xelkê kurdistanê bi şeweyek berfireh, awayek berbiçav bi xwe parastin ji beşdariya di vê maşkanêyê de, bi



kiryar we çavniheriya me bi cih anî û rastiya wê arxayîniyê we selimand. Herweha we nîşan da ku rejîm ji aliyê xelkê ve wek hertim îzole û bi binpêkerê maf û azadiyên xwe dizanin û di hember de tekoşerên kurd û partî û rêxistinên wê çiqas bi qedr û qîmet in.

Ew helwesta lawên netewa kurd di Kurdistanana Îranê de ku sindoqên betal bi ser kirêgirtiyên Komara Îslamî de vegeandin, bi bê gotin ket ber çawên bîrûraya giştî, û heklî karbidestên Komara Îslamî bi wan hemû fend û fêlan ku têde şehrezane, her encamekê ji hilbijartinan nîşan bidin, tê digijin ku rastiya wê çawane û pêgeha

wan di kurdistanê de çiqase.

Roja înê 12'ê Reşemê, roja serkevtina Îradeya polayîn a xelkê kurdistanê û roja daketina morala rejîm û kirêgirtiyên wê li kurdistanê bû. Her ji ber wê, ew serkevtina han ji xelkê kurdistanê û hemû ew kesên pêkhînerên wê bûn, pîroz dikin, dest xweşiyê ji we re dibêjin û bi hûrmet ve ji yekdemî, yekrêzî û yekhelwestiya wan dinêrin.

Herweha cihê xwe ye ku amaje bi helwesta netewên din ên Îranê û azadîxwazên welat bikin ku mil bi milê Kurdistanê bi kiryar, "Na" bi rejîmê gotin û hewlên rejîmê ji boy rakêşana xelkê bo ser sindoqên

hilbijartinê nezok hêlan.

Hevdem weke Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistanana Îranê û Partiyê Demokratî Kurdîstana Îranê sopas û rêz, emegnasî û pêzanîne xwe pêşkêşî hemû lawên çavnetirs û kolneder dikin ku bi helwesta netewa xwe ber bi daxwaza me hatin û rojê din a tijî ji serwerî xistin ser rûpelên dîroka xebata rewşa ya netewa xwe. Seba wê bi heq em pê serbilindî û bi germî destên tak take wan digivîşin. Erxaînin ku berdeyamî ji xebat û micidî li ser mafên xwe ên rewşa, serkevtina herî zêde û gehîştin bi mafên xwe misoger dike.

Cardin sopas bo we xelkê xebatkar û xweragirên kurdistanê

Serkevtin ji bo xebata me ya rewşa

Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistanana Îranê Partiyê Demokratî a kurdistanana Îranê

13'ê Reşemeya 1390 a Rojî 3'ê Marsa 2012'an

Spas û pêzanîna

Xelkê hişyar û mafxwaz ên Kurdistanê!

Endam û aligirên emegdar ên PDKÎ!

Roja 12'ê Reşemê, Komara Îslamiya Îranê listika binav hilbijartina Meclîsê li raserî Îranê de birêve bir û li Kurdistanê de jî her wek hemû agehdar in, ew şanogeriya birêve bir û li ber çavê hemû xelkê cihanê û bi agehdariya bîr û raya giştî ya Kurdistanana Îranê, ew qasê şermezar û bê pêgehbûna xwe derxist, û li raserî Îranê û bitaybetî li Kurdistanê de rêjeyek gellek kêma beşdarî li vê şanogeriye de kirin, û di vê qadê de rûreşî ji bo rejîmê û kirêgirtiyên wê ma, û li ber çavê her hemîyan pîlanên rejîmê bûne bilqa ser avê.

Xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê!

Bê guman mana xelkê Kurdistanê bi tewaya tex û qatên wê û xelkê tewaya gund û bajarên Kurdistanê li malên xwe de û neçûna wan bo ser sindoqên şanogeriye car din derxist ku xelkê Kurdistanê, wate neteweya hişyar û azadîxwaz û mafxwaz ê Kurd, vê rejîmê li tewawiyeta xwe de naxwazin û bi tu awayekê bi firt û fêlên wan û sextekariyan nahên

xapandin û dest û pêwendiyên rejîmê bi tenê dihêlin, bona vê ku li her demekê riswa û rûreştir û wek kopalbidestên celadan bêne binavkirin.

Xortên tekoşer ên demokrat!

Eva ku xelkê Kurdistanê şanoya hilbijartina rejîma Îranê bi awayek berçav baykot kirin, û sindoqa pîlan û firt û fêla rejîma Îranê bi betalî hêlan, nîşanderê yekdemî û hevhelwestiya neteweya Kurd û xelkê Kurdistanê bû, û di vê navberê de divêt qala hevdengiya partî û rêkxirawên Kurdistanî bê kirin ku di vî warî de hevhezir û hevterîb bûn û pîlanên rejîmê baykot kirin.



Lê divêt rêz ji hewla bê rawestiyana ya we xortên demokrat û rêvîngên rîya Qazî û Qasimlo û Şerefkendî bê girtin ku bê guman erknaşî û mandînenasiya we û zehmet û mandîbûn û karê bê mînak û

cesûraneye we li pêxeama agehdarkirina xelkê ji siyaset û helwesta partiya we PDKÎ, li pûç û mandelkirina pîlanên Komara Îslamî de hebû û we bi hemû kesê de selimand ku hûn xortên Demokrat bi destê betal lê bi moral û hesinîn, û bi bîrek vekirî û pêrewî ji rê û şopa demokrat bi ser hêza teyar ya kevneperestî û pîlangêre rejîma Îranê de serdikevin û bi xatircemî ve serkevtin bi îman û îrade û hewl û têkoşîna tewaya tekoşer û xebatkarên demokrat û xortên cesûr ê gel digîje armancê.


Carek din hewce ye ku em rêz û spasiya tewaya wan kesasn bikin ku di vî heyamî de ji bo gehandina siyaset û helwestên PDKÎ derheq tehrîma şanogeriya hilbijartinê bo nav xelkê tekoşin kirin û destê mandînenasiya wan biguhişînin.

Pîrozbahiyê li tev xelkê Kurdistanê û bitaybetî ji qutabiyên qutabxaneyê Demokratî dikin bo tomarkirin û bidestxistina vê şanaziyê.

**PDKÎ
Komîsyona Teşkilat
13. 12. 1390**



Hejmar 178, 05'ê Adar 2012



Astengiyên Demokrasiyê di Îranê de

Beşa 3

Di nav guhertinên nû yên Îranê û di rastaya geşkirina hişyariya netewî di herêmên derveyî nawendê, ronakbîrên siyasî ên civaka serdest, wateya "qewm" ji bo netewên din bikar dibirin û bikar tînin.

Şûnasa netewî

Hebûna îradeyek ji bo yekgirtina siyasî û civakî û herweha îrade bo çêkirina

yekîneyek hevbeş, di pêkhatina şûnasa netewî a îroyîn de rolek bingehîn heye. Ger şûnasa netewî bi wateya hesta girêdayîbûn, emegdarbûn û yekgirtina bi kom a girûpan wate girûpên cuda di bazneya sînorên cuxrafiyayî a diyarîkirî de, bê pênasekirin, bêguman divê li ser xal û simbolên şûnasê pêdagîr bin ku berfirehtir û hevbeş bin.

Di gelek ji civakên îroyîn de, li gor pênaseya "Antonî Smî", qewmên kevn ku xwedî erziş û xalên hevbeşê ên çandî, dîrokî, cuxrafiyayî, zimanî û hesta yekgirtîbûna netewî ne, karîne di pêvajoya guherînên civakî û siyasî, xalên hevbeşên qewmî bo şûnasa netewî biguherin û di çarçoveya sînorek cuxrafiyayî de, mafên netewî ên xwe bidest bixin.

Di hinek ji civatên modern weke Amerîkayê, di pêvajoya pêkhatina şûnasa netewî, diyardeyek bi navê qewmîyeta kevn tune bû, herweha di hinek ji civakên din de weke welatên Erebi, Fars û Tacîk yan Turk û Azerî, qewmên hevbeş ên kevn, di çarçoveyek cuxrafiyayî de negihîştine mafên siyasî ên hevbeş.



Ebdulla Hicab

Pêka pênaseyên zanistî, peyvên "netewe" û "şûnasa netewî", wateyên modern in ku dîroka wan vedigere bo guhertinên modern di civakan de, bi taybet guhertinên şoreşa senetî a Ewrûpa di sedsala 18'an de û herweha şoreşên siyasî-civakî ên cihanê weke şoreşa sala 1789'an a Firansayê.

"Îrnêst Rinan", zanayê Firansevî, di pênaseya netewe dibêje ku netewe komek ji xelk e ku dikare tenê li ser bingeha îtifaqek weke rîfrandom pêk bê.

Eva di halekê de ye ku modernîstên weke "Karil Dûyîç", "Îlî Kidûrî", "Êrîk Habsbawm" û "Binidîk Andirson", wateya netewe bi diyardeyek dizanin ku bi sedema guhertinên kûr ên civakî weke senetîbûn, temerkûza desthilatê, armancên siyasî ên ronakbîrên civakê û ji hemiyên girîngtir avabûna seneta Çapê, geşkirina sîstema hevbeş a perwerde û zimanê nivîsînê, çê dibe. Her du nêrînên han, şûnasa netewî weke diyardeyê wek lihevhatinê dihesibînin.

"Kilad Loy Straws", zanayê Firansevî jî li ser vê baweriyê ye

ku pênasekirina diyardeyek bi navê "şûnas" weke diyardeyek xweser a civakî nemumkin e. Bi bawerîya wî, mijarek ku weke şûnas tê naskirin, pênaseyek e ku civaknasan tenê bas ji hinek aliyên hevbeşiyên çandî dikin. Di rastî de şûnas komek ji buha û pirsên çandî û saykolojî ne ku weke xala hevbeşa girûpek ji xelk li hember xelkên din de tê nasîn. Di dîtingeha Stiraws de, şûnas diyardeyek modern, çêkirî û berhema projeyên siyasî ên ronakbîrên civakan e.

Her çend ku dîtingehên baskirî nikarin ji bo şûnasxwazan û desthilatdarên îro ên welatan, dîtingehên tewaw û razîker bin, lê nabe haşa ji vê yekê bê kirin ku pêvajoya avabûna netewe, tenê projeyek siyasî ye. Jiber ku bo mînak di demên pêş ji avabûna diyardeya netewe-dewlet di Îranê de, yan di welatên cînar weke Turkiye û piştî Îraq û Sûriye, tu nîşaneyek ji şûnas yan xalên hevbeş ên netewî ku li ser bingeha ziman, çand yan sîstemek hevbeş ya siyasî, huqûqî û îdarî be, xuya nine.

Pêş avabûna dewletên modern di van civakan de, yekîneyên nîvxweser weke îdareya kar û barên herêmî û dadwerî hebûn û xelk şûnasek wekhev di gel civakên pêkînerê Împeratoriya Osmanî û Qacar bitaybetî şûnasa desthilatdarên civakê hebûn.

Pêkhatina diyardeyek bi navê şûnasa netewî a "Netewa Îranê", vedigere bo dema desthilatdariya hikûmeta paşayetî a Riza Pehlewî. Wî bi mifahwergirtin ji mista

asinî û zor, pêvajoya pêkanîna şûnasek netewî li ser bingehên simbolên weke zimanê Farsî, meseba Şîe û cuxrafiyaya siyasî a wê demê ya Îranê û bo gihîştin bi armancên xwe ji tu kiriyarek xwe neparast. Ji wê demê heya niha dîtingeha zal di Îranê de bi tengkirina bazneya pênaseya çemka "şûnasa netewî a Îranî", gişt netewên pêkhênerê civaka Îranê weke yek netewe dihesibîne ku li ser hema xalên hevbeş ên ku Riza Şa li ber çav girtibû, wate zimanê Farsî, meseba Şîe û ..., neteweyek pêk anî.

Di vê rewşê de em nikarin cudahiyeke wusa di navbera pênaseyên Riza Pehlewî û Xamineyî (ku meseba Şîe û zimanê Farsî weke remza şûnasa netewî dizane) di warê wateya şûnasa netewî a Îranê bibînin, û heta pênaseyên gellek ji siyasetvan û civaknasên nehikûmetî ji wateya şûnasa netewî jî her bi vî awayî ye.

Hemû ew dîtingehên baskirî li ser bingeha nêrînek xweperest û pawanxwaz ji wateyên maf û şûnas, şûnasa netewî û mafên bingehîn ên neteweyên derveyî bazneya desthilatê înkâr dikin û pejirandina şûnasê cuda weke metirsiyek ji bo parçe parçebûna Îranê dizanin.

Di vê rewşê de gellek asayî ye ku netewên derveyî bazneya desthilatê, beravajî pênaseyên baskirî ji şûnasa netewî ku zêdetir aliyên zêhnî a wê heya aliyên zanistî û emelî hatiye berçavgirtin, girîngî bi aliyên weke maf û buhayên wekhev bidin.

Lewma siyaseta netewesazî li ser bingeha desthilata hikûmetek nawendî ji destpêka paşayetî a Pehlewî heya niha di gel astengiyên micid berbirû bû. Lê Riza Şa bi mifahstandin ji hêzên leşkerî karî neraziyên perawêzist li Kurdistan, Belûcistan û herêmên Erebakincî serkut bike û pêvajoya avakirin "netew Îranê" pêşve bibe. Pêvajoyek ku serhildana xelkê di wan herêman di dirêjahiya dîrokek de nîşanderê şikesta wê ye.

Di nav guhertinên nû yên Îranê û di rastaya geşkirina hişyariya netewî di herêmên derveyî nawendê, ronakbîrên siyasî ên civaka baladest, wateya "qewm" ji bo netewên din bikar dibirin û bikar tînin. Di rastî de wateya qewm bi merem ve di pêwendî li gel şûnasa netewa Kurd û netewên din tê bikaranîn. "Qewmîyet" bi qonaxek ber ji pêkhatina "Netewe" tê gotin, mafên ku qewmek dikare di çarçoveya bazneyek cuxrafiyayî de bidest bixe, bi tu awayekî bersivderê daxwazên netewî ên xelkek ku di gel newekheviyê berbirû bûne nine.



Kirîz û alozî afirandin bi rêya terorê

Têkdana ewlehiya siyasî û civakî di welatên dijberê ideolojiya Komara Îslamî li cîhanê armancek van kiryarên terorîstî ye. Siyaseta xof û çavtirsandinê erkeke fermî ya sazî û dezgehên leşkerî, ewlekaîr û heta çandî û dîplomatîk ên vê rejîmê ne.



Azad Kurdî

Eşkrebûna hewildan ji bo encamdana kiryarên terorîstên Îranî yê girêdayî sazî û dezgehên leşkerî

û ewlekarî yê Komara Îslamî li çend welatên biyanî, carek din hewildanên hikûmeta Îranê ji bo rêvebirina çalakiyên terorîstî û alozî afirandinê li welatên derve bû mijara rojevê. Hewildanên terorîstî li Amerîka ji bo terorkirina Balyozê Erebestana Seûdî, terorkirina dîplomatên Îsraîlî li Taylandê û kifşkirina çalakiyên 2 grûpên terorîstî yê girêdayî sazî û dezgehên leşkerî û ewlekarî yê hiukûmeta Îranê nimûneyên berçav ên herî dawî ne.

Piştî ku eşkere bû terorîstên ser bi Komara Îslamî dixwastin Balyozê Erebestana Seûdî li Amerîka teror bikin, medya û çapemenî û diplomasiya welatên rojava jî mijûlê şirovekirina kiryarên terorîstî yê Komara Îslamî bûn. Lê eşkere bûna du grûpên terorîstî yê ser bi Sipaha Pasdarên Komara Îslamî li Azerbaycanê ku dixwastin hevewelatîyên biyanî li wî welatî teror bikin, carek din rojev bi vê mijarê re germ bû. Kar giha astekê ku Îranê 3 car balyozê Azerbaycanê li Tehranê jî bo Wezareta Karê Derve gazî kir. Ji ber ku çalakiyên wan du girûpan eşkere bû û girêdayî Sipaha Pasdarên Îranê bûn û rayedarên Îranê nekarîn înkâr bikin, li hember vê yekê wan jî ragehandin pîlan û nexşeya terorkirina zanayên Îranî yê dawiyê bi rêya Azerbaycanê ve tê kirin!

Ji roja ku Komara Îslamî ya Îranê hat ser kar û hêdî hêdî dezgeh û rêxistinên leşkerî û ewlekarî ava bûn, teror û ji holê rakirina fizîkî ya neyar û dijberên raman û fikrî yê hikûmetê bû destûra karê wan saziyan. Di 33 salên borî de, hezaran kesayeriyên siyasî, rewşenbîr û çalakvanên sivil û nivîskar b destên grûpên terorîstî yê Komara Îslamî ya

Îranê li navxwe û bi taybet welatên biyanî û rojava hatine terorkirin. Teror û şehîdkirina 2 rêberên PDKÎ û hevalên wan li Viyena a Otrîşê û Berlîn a Almanîya nimûneyên zindî ne.

Têkdana ewlehiya siyasî û civakî di welatên dijberê ideolojiya Komara Îslamî li cîhanê armancek van kiryarên terorîstî ye. Siyaseta xof û çavtirsandinê erkeke fermî ya sazî û dezgehên leşkerî, ewlekaîr û heta çandî û dîplomatîk ên vê rejîmê ne. Avakirina çendîn saziyên wek Sipaha Quds ku li Iraq, Lubnan, Sûriye û çendîn welatên din çalak e û çalakiyên terorîstî rêve dibe mîna xuya ye di vê derbaêr de. Piştgirîkirina ji grûpên terorîstî û tundrew ên ideolojîk li Rojhilata Navîn yek ji pilanên din ên Komara Îslamî ya Îranê ye.

Li pirranîya alozî û kiryarên terorîstî yê cîhanê de ku dijî rojava û hêzên opozîsyona dijberê hikûmeta Îranê hatine meşandin heta niha, bi awayê rasterast û ne rasterast rayedarên payebilind ên Komara Îslamî û fermenderên hêzên ewlekarî û leşkerî tê de dest hebûne. Ev siyaseta dikare ji ber çend sedemên taybet bê meşandin ji aliyê karbidestên Komara Îslamî ve:

Yekem, ji holê rakirina hemû neyar û dijberên fikrî yê hikûmetê ku berevajî wan difikirin û kar dikin. Ji ber ku di Îrana bin siya vê hikûmetê de azadiyên takekesî û giştî yê sivil û siyasî qedexe ne û heta dest wan tê dijberên xwe teror dikin ji bo ewlebûna desthilatdariya xwe.

Duyem, herdem kirîzên siyasî û aborî yê navneteweyî Komara Îslamî rastî lêgerên cidî kirîye, bi her awayekê be li welatên biyanî li her cihek cîhanê hewl didin dîplomat, kesayeriyên siyasî û navendên girêdayî dijberên xwe yê sereke angoyê Amerîka û Îsraîl bikujin û biteqînin. Ango siyaseta şerê terorê bi dijberên xwe re.

Sêyem, mebestek din a encamdana van kiryarên terorîstî ev e ku rojava û wan welatan bitirsîne ku peywendiyên berfireh û nêzik bi wan re hene. Dixwazin bi afirandina alozî û çalakiyên terorîstî li welatên derve hêza xwe ya têkder wek gefxwarinê bikar bînin û zextan li ser xwe kêmkirî bikin. Ti welatek nikare bi tundûtûjî û afirandina alozî û çalakiyên terorîstî pirsgerêk û kirîzên xwe di navxwe û bi cîhana navneteweyî re çarser bike. Tenê karnameya xwe reştir dikin û temenê desthilatdariya xwe kin û kurttir.

Niqurçk

Xamneyî bê? Bila bê



Ceifer Mubeşirniya

Ji Xamneyî re mane "xitê û pitê"!!!

Çend rojan berî maşkanêya hîljartînen Meclîsa Mişkan! ay biborin şevra Îslamî a Îranê, dema ku Xamneyî dît, ne tenê opozîsyon, belkî heval û hogirên wî jî jê dûr ketine û gotin "Na" bo gerreseya Meclîsa 9'ê, neçar ma xincî girinîjîn û nişandana direnên xwe, gaziyek bilind bike û "kerr, kor, şil, goc, xurufî, kepcilmî û delingrizî" û mişk û horên xwe ku di gerisandinê de bikar tîne û li ser dizî, hîzî û bênamûsiyê kerr û kurom bibûn, ji xwe civandin û got: "Ev

hîljartîne pîr hesab e û gerek hemaseyan biafirînin".

Başê pîrê xurîfî, ger ew reş û rût bîrkêrî hemasan hatiban, dê di ciwanî û terrelawîya xwe de, tu bo pêşnimêjîyekê bigîjandîban Kerbelayê û we 1 milyon ciwan di gerreseya xwe de neditelîfandin!! Dê niha li ser sindûqên dengdanê jî te re rêz bibin ku çî nişanî cîhanê bidin? Wella te zû deng bikira minê pezên mamê xwe ên tebeş û hemû mişk û marên gundê xwe jî li sindûqên te rêz bikira!! Bextê te û bavê te me ew ji rêza wan teledîn, qirêjû û besîciyên ku te li televîzyona dewleta xwe de nişan dida ciwantir û bê guman aqiltir nebûn?!



Beşar Esed bê?!!!!


Ho hoo "Niqurçk" a vê carê dirêjek hewaserî heye!!!! Bila bê Wella Beşo tu hatîlî lê gelik direng hatî, pêtir dixuye ku tu rew ketibî yan jî tenîkeyek dî te girêdabin û te xwe ji deriyê "Niqurçk"ê kutaye. Ma cih nemabû qirik dirêjê kurrrrrê neqencî? Tu çima naçî tev Xamneyî û Potîn kebaben ku li ber agirê ser esmanê bajarê "Hums"ê dibirijî bixwey? Xweîna bi hezaran xort û zarok û xelkê Sûriyê li ser te ye û tu hatî dibêjî "Niqurçk" ka were ramûsanekê û keremke ji min xwedî derkeve. Niqurçkê bî jî û zirr kurên mîna te neven. Willa ez te ber deriyê xwe jî girê nadim.

Rabe derkeve kutiyê mirar. Li deriyê tu kesek din jî nede, çimku serê bavê "Hafizî" taze "ya tel binî çû".

Cenetî bê? Pal din bila bê!

Heho, "Şaxên keran guçên mara xweş ecayîb durunde". Roja 22'ê Şibata 2012'an devê "Ehmed Cenetî" Berpirsê Şevra Zêrevan yê rejîma Îranê vekirin û tenê didanek wî mabû. Tîlîlîlîlî., "Cenetî" bû 85 salî. Kurte jiyana Ehmed Cenetî: Cenetî di 22'ê Şibata sala 1927'an bi awayek nemeyî, diya wî ew beravêt. Hinan digot ewe circe mişk e, hina jî digot rimûzad e, hinan digot ne eva pîzdane, bi her awayekê ew zindî ma, lê diya wî baban çolî bû û hewişî "Cenetî" xwe gihand guhanên cur bi cur û firçîk girt. Navbirî gellek dixwar lê bibû mêşko û çênebû û her diçirijî. Dema ku rabû ser lîngan, dibêjin di devera wan de qutabxane tune bûye lewma ji xwendina Akadimîk bêpar maye. Lê ez bawer nakim û min jêva ye ku bi vê bejn û bala ku niha heyî û di zaroktiyê de jî rengê beşeran nedaye; bona wê ku qutabî jê netirsîn û qutabxaneyê bi cih nehêlin ew ranegirtine. Cenetî di kûçe û kolanên Îsfahanê de xwe hînlî melatîyê kir û ji ber ku rast û çepên xwe ji hev cuda nedikirin, û nedizana guhertina nîzamê çiyê, destpêk melayê "Derbara Şah"ê Îranê bû û piştê jî bû pêskoyê ser derecanên Xumênî û Xamneyî.

Niha ew 85 salî ye û niha jî axaftinan pusxur dike û dide derê, hêvîdar im carê nemire hêj rezîl bibe ew "xoş ecayîb durundeye".



Hevdîtinên birêz "Mistefa Hicrî" li welatê Birîtanyayê berdewam in

Hevdîtinên birêz "Mistefa Hicrî" Sekreterê Giştî yê PDK Îranê li welatê Birîtanyayê berdewam in û rojên 29'ê Şibat û 1'ê Adara 2012'an tevî Balyozê Amerîka li welatê Birîtanyayê û Bîroya Sereke a Lîberal Demokratîk hevdîtin pêkanîn.

Di vê hevdîtinê de girîngtirîn bas li ser rewşa Îranê û pirsgerêkên ku Komara Îslamî ji xelkê Îranê û civaka navnetewî re pêk aniye hatin kirin. Di beşek ji wan basan de birêz Hicrî boçûnên PDK Îranê ji beşdarên civînê re şirove kir û tekez li ser vê yekê kir ku dema tê dîtin heya



niha gişt hewl û xebatên ji aliyê azadîxwazên Îranî û civaka navnetewî bi armanca pêkanîna guhertinan di siyasatên nemirovane ên rejîma Îranê de bê akam bûne, di cih de ye ku niha pêda li cihê hizrîn li ser guhertina siyasatên rejîmê, pêtir pêdagirî li ser darêtina bernameyan bi armanca guhertina rejîma Komara Îslamî bihê kirin.

Herweha êwariya roja 1'ê Adara 2012'an, ji aliyê Bingeha Sed Sala Pêşde Bo Aşitî Li Rohhilata Navîn, semînarek bo Sekreterê Giştî yê PDK Îranê birêz "Mistefa Hicrî" pêkhat ku hejmarek berbiçav ji rojnameyan û kesayetiyên siyasî ên Birîtanyayê û Kurd beşdar bûn.



û guhertina wê bi sîstemek demokratîk, sekolar û Federal ku tev netewe û kêmaniyên din ên Îran têde beşdar bin. Rewşa han hewcehiya lihevhatinek xurt weke alternatîva pêşerojê li ser pîvan û pîrensîbên demokrasiyê û liser bingeha cuxrafi-netewî di nav neteweyan de derxist. Li encam de di 20'ê Fêvriya sala 2005'an, bi beşdariya 17 rêxistinên netewî û herêmî, Kongireya Netewên Îrana Federal weke mîkanîzm û alternatîva siyasî a herî baş ji bo pêşeroja Îran hat avakirin û bo yekem car di qada siyasî a Îranê de dest bi xebata xwe li dijî rejîma Komara Îslamî kir.

Di 20ê fêvriyeya sala 2005'an de, weke lêjneya avakerên Kongireya Netewên Îrana Federal, di Civîna Lendenê de bi beşdariya 16 partî û aliyên siyasî û nûnerên netewan bername û esasnameya Kongireyê pejirandin û wajo kirin, ku pêk hatiye ji 13 made û çend têbîniyan û têde bi hûrî bernameya Kongireyê bo pêşerojê hatiye şirove kirin û serbarê tekezkirin li ser şewazên aştxwazane, ji hemû rêkarên xebatê bo hiloşandina rejîmê û gihîştina bi armancên xwe mifahê distîne.

Bi giştî pêkhatina gongireya Netewên Îrana Federal bi hewl û xebata PDKÎ, gavek gelek erênî û hewce bû li rastaya giştîgîrkirina xebatê û lihevnezişkîbûna netewên çewsandî li Îranê de û kariye bibe deng û rengê tev netewên Îranê û azadîxwazî û mafxwaziya wan ji her demekê pitir bigehîne guhê çîhanê û raya giştî.

Herweha wan jî bi nisbet zulm û zorî û pawanxwaziya Komara Îslamî baştir haydar bike ku bêguman teîsîr li ser pêvajoya xebata siyasî li Îranê û bileztirkirina wê, herweha hişyarkirina tev qat û texên civakê bi nisbet mafên xwe kiriye û dikare baştirîn bedîl û altirnativ be bo rejîma Îranê ku him desthilat parve dibe nav netewan de, him jî azadî û edalet misoger dibe, him jî hesta şaromendiyê bihêztir dibe. Bi awayek din kongireya han cîgirê herî guncaw e ji bo Îranek pîrnetewe, pîrçand û rengîn.

Alternatîva herî baş bo pêşerojê

Rewşa siyasî û karesatbar a mirovî di Îranê de bû sedema vedîtina tedbîrek nû bal neteweyan li dor jinavbirina desthilat û hêza totalîter û dijîmîrovî a Komara Îslamî û guhertina wê bi sîstemek demokratîke sekolar û Federal ku tev netewe û kêmaniyên din ên Îranl têde beşdar bin,rewşa han hewcehiya û girîngiya lihevhatinek xurt weke alternatîva pêşerojê li ser pîvan û pîrensîbên demokrasiyê û liser bingeha cuxrafi-netewî di nav neteweyan de derxist



Arif Velzî

Îran welatek xwedî çand û şaristanîyek kevnar e ku gellek netewe, meseb û ayînên cuda têde dijîn û mafê wê hindê hene ku bi awayekî wekhev di îdareya siyasî a welat de beşdar bin, lê di dîroka xwe ya ne gelek dûr de, hertim ji

aliyê neteweya serdest ve hatine bêpar hiştin û mafên xwezayî û siyasî yên wan netewan ji aliyê desthilatên hakim ve hatine zewtkirin.

Her di serdemê desthilatdariya Riza Şayê Pehlewî de bo yekem car bi pîlanek darêtî û di piroseyek bi navê Netewesazî di Îranê de, dest avêtine farsîze kirina netewên Turk, Belûç, Kurd, Erebi, Turkmen, Ermenî û Asûrî û ...hwd ên Îranê.

Herweha piştî herifandina rejîma paşatî û hatine serkara desthilata îslamî ji aliyê Xumeynî ve heya niha bi awayên cuda, lê di rastî de bi yek merem dest bi jînosayda çandî, kulturî, zimanî û siyasî netewên din di Îranê de kirin.

Di hember wê siyaseta dijî mirovî ku heyamê çendî dehikan e di Îranê

de tê pêrewkirin û birêve diçe, netewên ne Fars hertim bersiva wê siyaseta Faşîstî û şovenîstî dane û li hember de sekinîne, lê ya rast carê nekarîne bigihîjina çî mafên xwe. Jiber tîratiya dîktatorî û rijdiya serkutê, netewên din xincî neteweya Kurd nekarîn li qada xebata eşkere de bimînin û bibine alava zextê li ser rejîmê, lê bi xweşî ve hişyariya siyasî û netewî a wan li salên dawîn de geşeyek berbiçav kiriye û kêr û zêde ketine liv û tevgerê bo mafên xwe. Ev yeka jî bû sedema pêkanîna rewşek nû bo xebatek tevalî û bihevve.

Ew rewşa siyasî û karesatbar a mirovî di Îranê de bû sedema vedîtina tedbîrek nû bal neteweyan li dor jinavbirina desthilat û hêza totalîter û nemirovî a Komara Îslamî



Destêwerdana Rûsiye û Îranê di nav karûbarên Sûriyê de

Radeya danûsitandinên tîcarî li navbera Îran û Sûriyê de tenê li sala 1389'an de pitir ji pênc milyar dolarî bûye, û her du welat di warê çêkirina tirombêlan, pişeya gerîdeyî, çêkirina binkeyên elektirîk û pişesaziya neft û gazê pêwendiyên gellek nêzik bi hev re hene.

Heya niha hem Îran û hem jî Rûsiyê ragehandine ku ew di jî her cure

destêwerdanekê di nav karûbarên Sûriyê de ne, û ragehandine ku ew daxwazkarê vê yekê ne ku hem rejîm û hem jî opozîsyona Sûrî bihev re li ser maseya gotûbêjan rûnên, û welat ji vê kirîzê rizgar bikin. Eva jî di demekê de ye ku hem rejîma Beşar Esed li ser kuştara hovane ya xelkê nerazî pêdagir e, û hem jî xelkê nerazî bi qehremantîyek bê mînak ve li hemberî rejîma Beşar Esed de sekinîne û redigehînin ku heya hîloşîna rejîmê ew dest ji wan meşên xwe hilnagrin.

Rûsiye jî bi vetokirina biryarnamîyên bi dijî rejîma Beşar Esed heya niha jî hewil dide ku pîrsa Sûriyê nebe pîrsek cîhanî û navnetewî, da ku konseya ewlekariyê nekare li gorî madeya 51'ê ya deqê ragehandina NY ku îzna destêwerdana leşkerî bi armanca pêşgirtina ji rêtina xwîna zêdetir ya xelkê medenî dide vê konseyê, tev bigere, ku bêguman ew hewla Rûsiye û bi taybetî rejîma Îranê ku bi eşkereyî ragehandine ku dijî destêwerdana derekî ne, tenê girêdayî berjewendiyên wan yê aborî û siyasî ne.

Li gorî serjimêriyên bilavbûyî



Şehab Xalidî

li "Misko Taymz" de sermayedanîna Rûsiyê li Sûriyê de li sala 2009'an de nêzik bi 19 milyar dolarê Amerîka hatiye ragehandin, ku ji bo Rûsiyê ew sermayedanîna pîr girîng e. Herweha yek ji şîrketên herî mezin ên neftî ên Rûsiyê bi navê "Tafneft" niha li Sûriyê de çalak e û ji sala 2010'an pêde alîkariya şirketa Millî a Nefta Sûriyê dike.

Ji aliyekî din ve ji sala 1977'an heya niha bendera Tertûs a Sûriyê di destê hêzên behrî ên Rûsiyê de ye, û ji vê benderê jî bo ragirtina gemiyên şerî ên Rûsiyê mifah tê standin, û hêzên behrî ên Rûsiyê dikarin bi rehetî xwe bigehînin avên Medîterane.

Herweha li gorî zanyariyan tenê bi sedema giringiya hilkewta erdnîgariya Sûriyê, Rûsiyê biryar da ku ji çar beşên qer û deynên xwe, sê beşan ji Sûriyê nestîne, da ku bi vê siyasîyê riyên xwe ên behrî zêde bike. Dema ku li sala 2008'an de Rûsiyê seba danîna sekoya dijî mûşekî ya Amerîka li

Lehistanê de gellek hest bi tirsê kir, Beşar Esed bendera Tertûs kire binkeya hertimî ya gemiyên şerî ên xwedî çekên navîkî ên Rûsiyê.

Radeya danûsitandinên tîcarî li navbera Îran û Sûriyê de tenê li sala 1389'an de pitir ji pênc milyar dolarî bûye, û her du welat di warê çêkirina tirombêlan, pişeya gerîdeyî, çêkirina binkeyên kehrebayê, û pişesaziya neft û gazê pêwendiyên gellek nêzik bi hev re hene.

Ji aliyekî din ve heke rejîma Beşar Esed ku di rastî de wek eniya berxwedaniya li hemberî Îsrailê de tê naskirin, nemîne û rojawayî û bitaybetî Amerîka bi ser herêmê de zal be, cuda ji têkşikana vê hevpeymanîya stratejîk ya li hemberî Îsrailê de, renga ew girupên tundrew ên mesebî ên dijî Îranê û dijî Şîî jî bihêz bin ku ji aliyê Erebestana Seudî ve tene piştevanî kirin, û berjewendiyên siyasî û aborî ên Rûsiye û Îranê bi yekcarî di vê herêmê de ji dest wan derkevin.

Di rastî de ew berjewendiyên aborî û siyasî sedema piştgiriya Rûsiye û Îranê ji rejîma Beşar Esed in, û heke rejîma Beşar nemîne her du alî jî dê wan berjewendiyên ji dest bidin, lewra ew radigehînin ku dijî destêwerdana derekî di nav

karûbarên Sûriyê de ne û bi vî awayî ew bi xwîna xortên Sûriyê bazerganiyê dîkin.

Hekî ne dema ku çend bi nav endazyarên Îranê îtirafê dîkin ku ew ser bi Sipaha Quds ya rejîma Îranê ne û ji bo beşdariya li kuştara xelkê sîvil ê Sûriyê de hatine wî welatî, û teqe li xelkê nerazî kirine, û di demekê de ku alîkariyên madî û locîstîkî ên Îranê bi Sûriyê jî bo her kes û aliyekê rohn û zelal bûye, û di demekê de ku Rûsiye sekoya muşekiya "S 300" dide rejîma Beşar Esed û karnasên xwe jî dişîne wir da ku fermanê Sûriyeyî di vî warî de perwerde bike, û ew sekoyên pêşkewtî ên dijî muşekî dikarin li hemberî êrîşên dereveyî de bikar bînin û rejîma Beşar Esed li ser kuştare pêdagirtir û hêvîdartir bikin, û di demekê de ku Rûsiyê nawên şerker ên xwe jî birine nêzikî avên herêmê, û di warê gehandina şevat, alîkariyên locîstîkî û Îtîlaatî alîkariya Sûriyê dike, û di demekê de ku li gorî gotina Ebdulselam Ehmed Ebdulrezaq fermanêkî cudabûyî ji arteşa Beşar Esed hêzên Beşar Esed li halê mifahwergirtina ji gazên seqetkirina esaban li jêr çavdêriya tewaw ya karnasên leşkerî ên Îranê û Rûsî li bajarê Homsê de ne, ku di rastî de ew yek nivşkujiyek tewaw e, û ew gaz niha di destê hêza çaremîn ya Garda Serkomariya Beşar Esed de ye, gelo ew yek heke destêwerdana leşkerî ew jî bi dijî pîraniya xelkê Sûriyê nebe, bes tê çî wateyekê?

Gelo ew kar û kiryarên wan mirovdostane ne, yan jî hekî êrîşên li gorî biryara Konseya Ewlekariya bona rizgarkirina xelkê Sûriyê ji destê dîktator û cînaetkarek wek Beşar Esed bê kirin?

Lewra hem Rûsiye û hem jî Îran her niha mijûlî destêwerdana leşkerî bi awayekî ne yasayî, û ne mirovî di Sûriyê de ne, û herçend mirov nikare bi xatircemî ve bêje ku ew alîkarî û piştevaniya Îran û Rûsiyê ji Beşar Esed û destêwerdana wan di nav karûbarên Sûriyê de wê heya çî demekê dom bike, yan jî gelo Amerîka û rojawayî vê êrîşî ser rejîma Beşar bikin yan ne, yan jî dê dest bi çekdarkirina xelkê nerazî bikin, lê ya diyar ew e ku rejîma Beşar Esed nikare xwe ji hîloşîna rizgar bike û hem Rûsiye û hem jî Îran wê tawana wan helwestên berjewendîxwazane ên xwe ku di ratsî de bazirganîkirina bi xwîna xelkê Sûriyê ye wê bidin, û bo heta heta jî wê şermezare dîroka mirovahiyê bin.

Li Kurdistanê baykot serkevt



Dara Natiq

Di çend heyvên derbasbûyî de, rejîma dijîmrovî û tepeserkar a Komara Îslamî a Îranê di berdewamiya siyasetên hovane û nemirovane ên xwe de, bi hegera birêvebirina maşkanêya bi navê hilbijartina

gera 9'mîn a Meclisê, rewş û zirûfek tewaw polîsî û emniyetî bi merema tirsandin û teslîmkirina xelkê mafxwaz û azadîxwaz yê gelê Kurd di Kurdistanê de birêve dibe. Hevdem pêvajoya destbiserkirin, girtin, îşkence û darvekirina xelkê sivil û çalakvanên siyasî û çandî, çalakên xwandekarî û... li Îranê bi giştî û Kurdistanê bitaybetî bi awayek berfireh û bigurtir ji berê dest pêkiriye û bi berdewamî ev pêvajo dimeşe. Rejîmê tenê di wan 2 mehên derbasbûyî de bi sedan çalakên çandî, rewşenbîrî, xwendekarên Kurd, çalakên mafê mirov li bajarên Kurd akincî ên weke Makû, Urmiye, Mehabad, Pîranşar, Sine, Merîwan, Boka, Pawe û... bi hegerên cur bi cur destbiser kirine û di dadgehên xwe yê ewlehî û nîzami de, hukmên gelek giran bi ser wan de sepandine û parek berbiçav ji wan jî bi cezayê îdamê re berbirû ne. Lê ceribîna zêdetir li sê dehikên deshîlata biyom û mirovkujê Komara sêdarê, dixuye ku rejîmê herdem siyaseta tepeserkirin û jinavbirina gelê azadîxwaz yê Kurd weke hîmê bîngêhîn yê siyasî û stratejiya şerxwazane a xwe, bi awayên cur bi cur û hovane birêve bîriye û bo gehîştin bi vê armanca xwe anku asmîlekirin û jinavbirina nasnameya netewa me, ji tu kiriyarek dijî mirovî xwe neparastîye.

Di heyamê wan sê dehikan de, girtin, kuştin, îdamkirin, zext û givaş, tepeserî, bêdadiya civakî, bêkarî, înkâr kirina nasnameya neteweyî, dizîna heyî û serweta Kurdistanê û gelek diyardeyên nîgetîv ên din, parek in li jiyana rojane a xelkê zulîmjêkiriye Kurdistanê. Gelên Îranê bi giştî û gelê Kurd bi taybetî, bûye goriyê siyasetên pawanxwazane û dijî mirovî ên vê rejîmê û qedêr û pêşeroja wî gelî bûye lîstika rayedarên nefam û berjewendîxwaz ên wê rejîmê ku hercarê û bi awayekî û bi taybetî bi berêvebirina maşkanêyên di bin navê hilbijartinê de bi armanca rewatîdan bi nîzama dîktator a xwe, mifahê ji wan distînin û bi wî awayî raya giştî a cîhana pêşkevînxwaz jî pê dixapîne.

Lê rejîmê vê carê jî bi rêkxistin û berfireh kirina pêlên destbiserkirin û îdamkirina ciwanên Kurdistanê, rewş û zirûfek polîsî û emniyetî bi ser Kurdistanê de zal kiribû bi wê meremê ku tirs û xofekê bixwe nava dilê xelkê netirs, mafxwaz û welatparêz ên Kurdistanê û bi berdewamkirina siyasetên tepeserkarane ên xwe, îradeya azadîxwazane a gelê me bifetîsîne û bi armanca rewatîdan bi deshîlata nedemokratîk û dîktatorane a xwe, xelkê bikêşe ser sindoqên dengdanê.

Lê bi xweşî ve, serbarê tev zext û givaşên rejîmê û berfirehtir kirina pêvajoya girtin û îdam û tepeserkirina xelkê sivil ji aliyê navendên tepeserkar yê rejîma mirovkuj a Komara Îslamî ve, xelkê azadîxwaz û welatparêz ên Kurdistanê, careke din û herwek berê, ala zebat û berxwedanê bi dijî siyasetên biyom û dijî mirovî ên vê rejîmê bilind ragirtin û dane xuya kirin ku, îradeya şoreşvanî û azadîxwazane ya netewa me tu carî teslîmê zulm û zora dujminan nabe. Kurdistan herwek berê dê bibe çepera berxwedan û dijberî kirin tevî bêdadî û jinavbirina dîktatoran. Xelkê azadîxwaz yê Kurdistanê vê carê jî serbarê tev siyasetên biyom û tepeserkarane ên rejîma dîktator a Komara Îslamî, bi gurtir kirina tendûra tehrîma hilbijartinê û neçûne ser sindoqên dengdanê, bersiva ne dane vê rejîmê û amade nebûn ku teslîmî siyasetên dijî mirovî yê vê rejîmê bibin.



Rojev Le nouvel Observateur

Gerên dîplomatîk û gefxwarin

N: Rine Bikmen

W ji Farsî: Agirî

Gelo rastî Îsraîl wê êrîşî ser binkeyên navikî ên rejîma Îranê bike û şerek mezin li herêmê de wê rû bide? Gelo Îsraîl dixwaze ku berî hatina buharê êrîşî ser navendên sereke ên navikî ên Îranê bike? Gelo rayedarên Îsraîlê di vê derheqê de hewcehî bi nîşandana çiraya kesk ya Waşingtonê hene?

Gelo rastî çalakiyên mehandina Uranyomê ji aliyê Îranê ve bi armancên aştîxwazane ye, yan jî bi armanca çêkirina bombeya navikî ji bo jinavbirina Îsraîlê ye? Gelo rejîma Îranê wê kengê oranyoma hewce ji bo çêkirina çeka navikî bi dest bixe? Gelo hilbijartina vebijêrka êrîşa leşkerî tenê vebijêrka baş û di cihê xwe de ye? Gelo ew tehrîmên ku ji aliyê YE û DYA'ê ve bi ser rejîma Îranê de hatine sepandin dikare hikumetek lawazbûyî wek Îranê biguherîne?

Gelo heke Amerîka û Îsraîl bi hev re êrîşî ser Îranê bikin, û Îran û hevalbendên wê jî bi dijî Îsraîlê dijkiyarê ji xwe nîşan bidin û li Îraq û Lubnan û kendavê de rewşê ne ewle û tev li hev bikin û nîrxa neftê jî jêhel here û karê terorîstî berfirehtir bibe, gelo rojawa dikare vê yekê qebûl bike? Gelo destêwerdana leşkerî bi dijî rejîma Îranê bi qazancê neyarên Îranê ên demokrasîxwaz e, yan jî hikumeta Îranê dikare vê êrîşê, bike hêcetek bona pêkanîna hevberdiya netewî û yekîtiya cîhana Îslamê?

Eva çend meh in ku bona bersivdana bi wan pirsan gerek dîplomatîk tê kirin ku di rastî de ew pirs nîşaneya vê yekê ye ku renge şerek mezin li herêmê de rû bide.

Barak Obama ku di wan dawiyane de hêzên Amerîkayî ji Îraqê derxistin û niha jî di nav hewildanan de ye ku hêzên xwe ji Efxanistanê de jî derxîne, dixwaze li van neh mehan de ku bo hilbijartina serkomariyê maye, pêşiya pêkhatina her şerekê li ser xaka Îslamê bigre. Ew berdewam jî vê yekê dibêje Binyamîn Netanyahu, lê bersiva Netanyahu ew bûye ku dem kême e, û

rejîm dixwaze binkeyên xwe ên navikî li jêr erdê de veşêre.

Gelo gefxwarinên Îsraîlê bi armanca handan û tûjkirina DYA û Birukselê ye da ku tehrîmên xwe bi dijî Îranê tundtir bikin, yan ji bo dilxweşkirina şerxwazên hevdeng ê xwe ye? Gelo gefxwarinên Îsraîlê ji bo vê yekê ye ku pîrsa gotûbêjên navbera Îsraîl û Felestînê ku hatiye jibîrkirin carek din nekeve ber behs û gengeşê? Gelo dixwaze ku bi Ayetullahên Îranê bide zanîn ku ew di ewlehîyê de nînin?

Mîrdagan serokê Mûsadê ji sala 2002 heya 2010'an li çendîn civînên veşartî bi seranên Amerîkayî re di navbera sala 2004 heya 2007'an hûrdekariyên "îstiratîjîyêk pênc alî" ragehand: Sepandina zaxtên siyasî, encama emeliyatên veşartî, zebata bi dijî pêşvebirina programa navikî, tehrîm û sernixûniya hikûmetê. Di telegrafeke nihênî de ku li meha Tebaxa sala 2007'an de bo DYA hate şandin li ser vê yekê pêdagirî hatibû kirin ku "DYA û Îsraîl û hevalbendên wan ku li ser wan pênc xalan hevhiroz in, divêt bi başî û bihevêre ji bo gihîştina bi wan armancan tekoşînê bikin". Wî herweha ragehandibû ku: "Hinek ji hewildanan di cihê xwe de bûn û encama wan bi dest hat, û hinek hewlên din jî divêt di dema xwe de bêne dan".

Di navbera wan emeliyatên veşartî de ya herî hestiyar ku dengvedanek berfireh hebû, terora zanayên etomî ên rejîma Îranê bûn. Di meha Çileyê Paşîn a sala 2007'an de Erdeşîr Hosêynpûr yek ji zanayên etomî temen 44 salî ku li Îsfahanê de çalakî dikirin, bi awayek cihê şik û gumanê hate kuştin. Li ser bîngêha zanyariyên fermî ew bi sedema bilavbûna gazê fetisî ye. Lê binyatên Îtîlaatî ên rejîma Îranê li ser vê bawerê ne ku ew bi destê kesên ser bi Îsraîlê hate kuştin. Di navbera meha Çileyê Paşîn a 2010 heya 2012'an şeş karnasên din ên Îranî ku di pirojeya etomî de kar dikirin di çend teqînan û kiriyarên terorîstî de hatin kuştin.

Bang! 8 ê Adar û di Kurdistanê de jin



Ji bo jinên Kurd di 8'ê Adarê de

Azadiya jinan dibe sedema pêşkevîna civak û çanda netewan û dewletên dagîrkerên Kurdistanê jî tucar nexwastine û ne îznê didin ku kultûr û çanda Kurdan pêşveçûnê bi xwe ve bibîne, jiber ku li dijî berjewendiyên siyasî û heta abûrî û çancî ên wan in.



Sefiye Xalidî

Her wek dizanin di 8'ê Adara Sala 1857'an de jinan li "Newyork" ê civînek li darxistin.

Jinan bi wê civînê xwe daxwaz kirin ku demjimêra wan ya kar di rojê de 8 demjimêr in û heq destekî weke hev ji wan re were diyarîkirin.

Lê belê di encama wê civînê de kargeha jinan hat şewitandin û bi qasî 100 jin di encama wê bûyerê de cane xwe ji dest dan. Her çend jinan ew daxwaza xwe dabûn pejirandin jî, tekoşîna birêxistinî ya ji bo mafên jinan di sala 1900'an de destpê dibe.

Di sala 1910'an de li Danmarkê konferansa Sosyalîst Enter Nasyonî ya jinan de roja despêkirina tekoşîna jinên Emerîkî 8'ê Adarê wek roja jinên kedkar ên cîhanê hat îlankirin. Di sala 1977'an de jî Neteweyên Yekbûyî 8'ê Adarê ji bo hemû jinan, ew roj wek roja jinên cîhanê bi fermî hat pejirandin, roja ku jin dikarin daxwazên xwe bînin ziman.

Lê çima biştî derbasbûna çendîn salan hîna di Kurdistanê de mafên jinan tînin binpêkirin û nikarin bînin ziman?! Çima jin heya wê demê jî tînin firotin û guhartin?! Çima heya niha jî tena serê xwe nikarin ji malê derkevin?! Çima roj bi roj amara jinên ku xwe dişewitînin û yan jî ji aliyê hevjiyên xwe ve tînin kuştin zêde dibe?!

Îro rojê ji sedî 70 dewletan mafên jinan di parêzin, di civata kurd de jî jinên serbest û demokrat hene lê mixabin pir kêmin. Hêjayî

gotinê ye ku jiber pirsgirêka nebûna "Kurdistan"ek serbixwe û azad ..., kultura kurd tevklî kultura welat û netewên desthilatdar bûye, lê çima gel bixwe hewil nade ku birêyek durist û gorûî kultura xwe riftarê bike?

Rewşa jinên kurd hîn jî ji hemû jinên cîhanê xirabtir e, ji berku hin zulmên jinantiyê û him zulmên netewî li wan dicing û Kurdistan weke welat û+ netewe bêpar e û ji aliyê perwerdeya netewî mirovî ve pare maye. Jinên kurd di nav jiyana rojane de pir bi kul û derdin, lê dîsan jî bi wan derdên giran berxwe didin û hewil didin bi serbilindiya xwe bijîn. Jinên kurd mirov dikare bi serbilindî bibêje ku tu tiştê jî jinên gişt cîhanê kimtir ninin.

Bi taybetî dema ku mirov çav bi şoreşên netewî ên Kurdan de dixişîne, berxwedaniya jinên heleheng di rûpelên dîrokê de tînin xuyakirin, wêca weke pêşmerge yan jî piştvanên şoreşan û heya

siyasetvan. Ew bi awakî xwezayî dîroka gelan ji wend a bûnê diparêzin, ku wan bidin aliyekê, dîroka xwe jî didin aliyekî. Heya kengî mîrên Kurd naxwazin ji vê yekê tê bigîjin ku ragirtina qedera jin û keçên xwe di destên xwe de û tepeseriya wan di berjewendiyên siyasî û heta abûrî û çancî ên wan in.

Çimku azadiya jinan dibe seba pêşkevîna civak û çanda netewan û dewletên dagîrkerên Kurdistanê jî tucar nexwastine û ne îznê didin ku kultûr û çanda Kurdan pêşveçûnê bi xwe ve bibîne, jiber ku li dijî berjewendiyên siyasî û heta abûrî û çancî ên wan in.

Civakek ku pirsgirêka jin çareser nekiribe tu car nabe civakek pêşkevî, her çendî em bibêjin û binvîsin jî, dîsan neçareseriye belkî gerek jin ji doza xwe xwedî derkevin û bi awayek zanistî lîstikvanên sereke ên xebata ji bo mafên xwe di civakê de bin.

Ji mîran jî tê xwastin ku ji pêşkevîna wan re nebin sebeb û wan mîna mirovan û nîva civakê bipejirînin û wan li kêleka xwe bikin heval û hevpar. Jin di jiyana xwe de mirov be û mafên jiyane hebin û bijî, nek ji mîr re bibin namûs, bila her kes ji kesayetî û rûmeta xwe xwedî derkeve û bibe berpirsyarê kar û kesayetiya xwe. Hêvî dikim ku rêz li rola jinên Kurd bihê girtin û dest bidin destên hev ji çareser kirina vî pirsgirêkê re civaka Kurd rengîn bikin ji mirovahiyê.

Pirsa ku hertim dikin sedemê kimzanî yan ji navbirina jinan wate dilpîsî ji xwe dûr bikin û ronahî bibînin ku serkevtin û tenahiya civakî bikeve di nava jiyana gelê Kurd de. 8'ê Adarê pîroz be li te xwîşk û dayîkê cîhanê bi taybetî Kurdistanê, hêvî dikim ku di vî rojê de dilê mirovan di seranserî cîhanê de mîna gulên bipîşkive berbi hewkeviya mirovan bi taybetî jin û mîran ve bimesînin.

Daxwaza rakirina qedexeya hicabê li ser jinên fûtbolîst hate kirin

Jang Cîlongê serokê demî yê Konfederasiyona Fotbola Asiyayê di nameyekê de daxwaz ji "Yûzêf Bilatêr" serokê Federasiyona cîhanî a fûtbolê (FIFA) kir ku mijara rakirina qedexeya hicabê li ser jinên fûtbolîst di civîna FIFA'yê de bixe ber bas.



Ji bo parastina rewşa saxlemiya fûtbolîstan, ji sala 2007'ê pêve hicab ji fûtbolîstan re hat qedexa kirin.

Di meha Juena sala derbasbûyî de Tîma Fûtbola Jinên Îranê, seba binpêkirina biryara qedexeya hicabê, ji lîstikên despêkî ên Olempîka li Ordenê hatin bêparkirin.

Ekber Mînerî:

Bo yad û bîranîna 59 ciwanên bajarê Mehabadê ku sala 1983'an ji aliyê rejîma Îranê ve hatibûn şehîdkirin, hêza Bêstûn jî li hember de 59 oparasyûn pêkanîn û ez di gişt wan oparasyûnan de beşdar bûm.

Hevpeyvîn: Kewê zer



Ekber Mînerî

Ekber Mînerî naskirî bi mam Ekber li sala 1961'an li gundê "Niyer" a ser bi devera "Jawaro" a bajarê "Sine" ji dayîk bûye û pêtir ji 30 salan e ku di PDK Îranê de xebata siyasî û netewî a xwe dimeşîne. Navbirî bi kurtî basek li ser xebata xwe di PDK Îranê de ji duheftînameya "Agirî" re kir:

Qonaxa zaroktî û nûciwaniya min vedigere bo serdemê hikûmeta "Paşatî", wate berî sala 1979'an. Ew qonaxa jiyana min di gundê "Niyer" de weke her gundek din yê dîrdeste Kurdistanê bi taybetî ku gundek şoreşgêr bû, ji her tiştî hatibû bêparkirin. Gundê me qutabxane tune bû, lewma ez bûm nexwendewar. Min kar û kasibî tevî malbata xwe dikir, heya bereberê şoreşa gelên Îranê û pêla wê şoreşê de vera me jî weke beşek ji Îranê ve girt û Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê jî xebata xwe bi aşkerayî destpê kir û hêzek bi navê Hêza "Bergirî" di hundirê Kurdistanê de ava kir û ez bûm endamê wê hêzê li beşa hêza "Bêstûn".

Hêza han çekdar bû, lê her di malên xwe de xebata xwe dimeşandin, karên wan çî bi çîkirina meimûriyetên partiyê bû û carna jî tev hêzên pêşmerge weke beledî erkê xwe yê partiyê birêve dibirin.

Zivistana sala 1983'an ez bi fermî ji mal derketim û bûm pêşmergeyê PDK Îranê ku hatina min bo pêşmergeyê hevde me bû tev cejna 2'ê Rêbendanê, salvegera damezirandina Komara Kurdistanê.

Kar û xebata me ku pirranî çekdarî bû, bo heyamê 6 salan wate

heya sala 1989'an li jêr navê hêza "Bêstûn" de her di derdora deverên Başûrê Kurdistanê Îranê dewam kir. Di wan salan de êrişên zaf bo ser wan deveran dihatin û di navbera me û hêzên rejîma Îslamî a Îranê de pevçûn çêdibûn. Ez di şerrên giran de li deverên "Yeylaq, Kamyaran, Jawaro, Kesnezana Seqizê, Pawe Ciwanro û çendîn deverên din de beşdar bûme.

Gundê Niyerê ku nêzîk 60 şehîd di riya serbestiya Kurdistanê de dane ku hemû endam û pêşmergeyên PDK Îranê bûn, pîrr hasas bû û rejîmê êrişên zaf bo ser xelkê wî gundî dikir û bi caran ew gund şewitandine û bêhurmetî bi jin û zarokan dikirin. Di navbera gundê Niyer, Tengîser û Mêraw de 9 paygehên rejîmê hatibûn avakirin ku me weke hêza Bêstûn ew yek nepejirand û me di şerrek pîrr giran de her neh paygehên rejîmê girtin û pêtirî 70 kesan jî me bi dil girtin û piştê me serbest berdan.

Bo yad û bîranîna 59 ciwanên bajarê Mehabadê ku sala 1983'an ji aliyê rejîma Îranê ve hatibûn şehîdkirin, hêza Bêstûn jî li hember de 59 oparasyûn pêkanîn û ez di gişt wan oparasyûnan de beşdar bûm.

Bi giştî ew 59 oparasyûn şerrên giran bûn û me derbek mezin ji hêzên rejîmê da, ku girtina 9 paygehên "Niyer" û "Tengîser" û "Mêraw" ê jî yek ji wan oparasyûnan bû. Di wê demê de bû ku biryarek partiyê ji me re hat ku gerek em paşde vegeyîyên bo çiya û bajarên bicih bihêlin, ji ber ku êriş bo ser me pîrr giran bibûn, me 58 oparasyûn çêkiribûn û yek mabû ku bigîje hejmara 59 şehîdên bajarê Mehabadê, me çend rojekan xwe gêzîrand û me oparasyûna din jî pêkanî û ewcar em vegeyîyan çiya û me gund û bajar berdan.

Me binkeyên pêşmergean li ser sînor û di axa Îraqê de ava kirin, lê hat û çû ji bo Kurdistanê Îranê berdeham bû. Heya sala 1996'an êdî awayê xebatê hat guhertin û bi awayên din me xebata xwe meşand heya niha ku pêtirî 30 salan e ez di vê çeperê de me û bi taybetî ku niha serrdem hatiye guhertin, ez pîrr dilxweştir im ji caran ku xortên me niha xwendewan in û bi teknolojiyaya serdem re têkildar in û xebata niha ku xebata medenî û ragihandinî û ger hewce be emê çekdarî jî bikin, pîrr bibandortir e ji xebatek çekdarî bi tenê. Bi bawera min em niha di her demekê bihêztir in.

Ez ji partiya xwe hez dikim û bi xwîna şehîdan wefadar bûme û dibim. Jiber ku xwîna şehîdan e ku ez di vê xebatê de ragirtim. **Heya ku Dr. Qasimlo sax bû, dilê min pîrr bi wî re xweş dibû, niha jî min wênayek wî daniye bal xwe û sebra min pê tê.**

Elî Kesnezanî, naskirî bi Mîrza Elî, li sala 1951'an li gundê Kesnezan yê ser bi bajarê Seqizê ji dayîk bûye û 32 sal e di xebat û berxwedana netewî di çarçoveya PDK Îranê de didomîne. Birêz Kesnezanî ji bo duheftînameya Agirî deriyê dilê xwe vekir û qala xebat û serpêhatiyên xwe di partiyê de kir:

Ez di malbateke siyasî de hatime dinê û bavê min endamê PDK Îranê bûye û di serdemê Komara Kurdistanê de jî çalakî di komara sawa a Kurdistanê de hebûne. Di vê malbatê de hertim basên siyasî û basên Komara Kurdistanê û PDK Îranê dihatin kirin. Ez jî di zaroktiya xwe de tevî hestên netewî û pîrsên siyasî de mezin bûm.

Min di temenê 6 saliyê de li gundê Kesnezanê dest bi xwendinê kir û heya pola 6'a seretayî û li wir pêve seba tunebûna qutabxaneyê navendî di gundê me de, min nekarî dirêjî bi xwendinê bidim. Piştê ez tevî birayên xwe ketim kar û xebata malbatê. Heya temenê 18 saliyê ez çûm serbaziye û di serbaziye de jî ji ber ku min xwendin û nivîsandina Kurdî her di zaroktiyê de dizanî, min ji serbazên Kurd re dersa kurdî digot. Her li ser vê pîrsê ez di serbaziye de çend rojan hatim hepsîkirin.

Piştî serbaziye jî ez û çend hevalên xwe lihevhatin û me di gundê xwe de qutabxaneyek Kurdî ava kir. Min sê şiftan ders digot. Dema sibeyan ji zarokan re, piştî nivroyan ji ciwan û şevan jî ji bitemenan re. Di wan heyam de bername û pêrewa hundirîn a PDK Îranê ji me re hat, peyamek gihîşt me ku şoreş dê çêbe û rejîma paşatî dê



Elî Kesnezanî

bihiloşe. Ew pêşbîniya PDK Îranê rast bû û şoreşa gelên Îranê destpê kir, ez jî tevî wê şoreşê bûm. Piştê min bi awayekê pêwendî bi PDK Îranê ve girt, me li Kesnezanê Komîteya Partiya Demokrat damezirand û em ketin kar û xebatê. Piştî şoreşê, bihara sala 1980'an bi awayek fermî ez bûm pêşmergeyê PDK Îranê û min çeka şerefa Kurdatiyê hilgirt.

Wê demê Hêza Şehîd Ezîz Yûsifî hebû û me di hêzê de xebata çekdarî meşand, eva di dema fitwaya Xumênî li dijî gelê Kurd bû û me jî li hember wê fermanê berxwe da û bo heyamê 2 salan me pêşî ji êrişên rejîma Îslamî a Îranê digirt û em di wan du salan de tûşî şerên dijwar û giran bûn.

Êdî êrişên rejîmê zêde bûn û em paşve vegeyîyan bo çiyayan, lê xebata me ya çekdarî di gund û bajarên de her dimeşiya. Biheran em derbasî kûrahiya Kurdistanê Îranê dibûn û payîzan jî heya bihara din em li binkeyên partiyê de diman. Wê demê jî binkeya komîte û hêza Seqizê li "Şilêr" li ser sînorê Îran û Îraqê, lê di axa Îraqê de bûn.

Di dirêjahiya xebata xwe di PDK Îranê de hevjiya min jî tevî min bûye. Berî ku ez bibim pêşmerge min jiyana hevpar pêkanîbû. Demekê rewşa me di jêr êrişên rejîmê de pîrr xirab bû û min hevjiya xwe şand bo mala birayê wê û piştî 4 salan car din vegeyîya bal min. Dema ku vegeyîya, pêşmergean ode(jor)ek 2x3 bi telîsên teji ax bi bilndiya metreke jî me re ava kirin.

Me heyamekê di wî kolîkê de derbas kir. Wê rewşa nebaş a jiyana me jî tucaran tesîr ji morala hevjiya min nekir û tu car gilî û gazinc ji min nekirin, çimku ew ne tenê hevjiya min e, belkî hevçeperek bi bandor a xebata min di partiyê de ye.

Bi wî awayî min jiyana û xebata xwe meşand û piştê em hatin bo Qendîlê û piştî heyamekê din em ketin kûrahiya bajarên Kurdistanê Îraqê û heya niha jî ez di meqerên partiyê de pêşmergeyê vê partiyê me û bi dil û can.

Ji min re tu tiştêk girîng nine tenê erkê netewî û yê partiya min nebe. Di destpêka pêşmergeyê xwe de min berpirsatî hebûne û hey Cihgirê Komîteya Navendî yê PDK Îranê jî hilkişyame û niha jî ez endamê Navenda 1 a Kurdistanê me, lê di her qonaxê xebata xwe de di her berpirsatiyekê de, evîn û heza min ji partiya min re her wek hev bûye.

Niha jî weke sala 1979'an tê pêş çavên min ku dê şoreşek çêbe û rejîma Komara Îslamî a Îranê jî bihiloşe. Moral û hestên wê demê ên şoreşa gelên Îranê niha jî bi bihêzî ez li derûna xwe dijînim bo xebatê.

Hejmar 178, 05'ê Adar 2012



Puldeşt

yê herêma Puldeştê, Kurd bûne. Li serdemê deshilatdariya paşayên Sefewî û Efsarî bi sedan hezar malbatên Kurd yê herêmê bo aliyê Xurasanê li rojhilata Îranê hatine sirgûnkirin ku niha jî li Xurasanê dijîn û navên wek Zengelfî û Eres li Xurasanê danîne ser wî erdî, û eşîrên Kurd yê Şêxkanlû û Mîlan li Xorasanê pitir xelkê herêma Puldeştê ne.

Li Şûnwarên kevna yê Şaristana Puldeştê em dikarin îşarê bi hemama dîrokî a Pûrnak li gundê Pûrnakê, dêra Qizil wenik, Çiyayê Ber rêj, li sînorê Îran û Komara Azerbaycanê bikin.

Herêma Puldeştê xwediyê gelek hunermend û kesayetiyên welatperwer e û xelkê herêmê li rêya Kurdîniyê de gellek Şehîd pêşkêşî doza Kurdistanê kirine. Her wiha li serdemê serhildana Agirî de gelek ji xelkê herêma Puldeştê li refên Şorşgêrên wê serhildanê de cih girtin û xebatekî zaf ji bo azadiya gelê xwe kirine ku ji stranên ku li derheq serhildana Agiriyê hatine gotin îşare bi navê hin ji wan kesan hatiye kirin. Hunermend Kavûs Mîlanî yek ji hunermendên herî naskirî yê Kurdistanê û herêma Puldeştê ye ku dengê gelek zelal û xweş heye û stranên welatparêzî jî dixwîne.

Bajarê Puldeştê

Li herêma Puldeştê seba siyasetên dewleta Îranê Kurd bi hemû awayî tî tepeser kirin. Ew siyaseta qirêj a rejîma Îranê bûye sedem ku hejmarekî zaf ji Kurdên herêmê bo bajarên dinê yê Îran û Kurdistanê koçber bibin û bi awayekî berçav nifûsa Kurdan li herêmê de kêmbibe.



Mecîd Cinîkanlû

Puldeşt yek ji bajarên parêzgeha Urmiyê ye. Pêka serjimêriya giştîya sala 1387'an a Rojî, 14000 kes nifûsa

wî bajarî bûye. Ew bajarê xweşik li cem Çemê Eres wek mezintirîn çemê çar perçê Kurdistanê cih girtiye û dîmenekî bê qas ciwan daye wî bajarî û li bajarê Puldeştê bi hêsanî mirov dikare mêzeyî bajarê Şah Textî li Komara Otonom a Nexcewanê bike.

Puldeşt li herêma sînorî a Rojhilatê Kurdistanê li gel Komara otonom a Nexcewanê hev sînor e, û dirêjahîya sînorê Rojhilatê Kurdistanê li gel Komara otonom a Nexcewanê nêzîkî 125 kîlometrê hevpar e û li ser çemê Eres pirekî Têkiliyê ji bo hatûçûnê hatiye lêdan ku xelk ji pira han ji bo karê bazirganî û gerîdeyiyê mifahê werdigrin. Ew bajar li bakûr ve tevî Komara Nexcewanê, û li başûr tevî

Şaristana Qerezîyadîne û li rojava tevî şaristana Makû û Şûtê hevsînor e.

Seba cihgirtina Puldeştê li cem çemê Eres, parek ji erdê vê şaristanê şînkati û çiyayî û para dinê jî Xîz e. Rewşa vê şaristanê li çav herêmên din yê parêzgeha Urmiyê germ e.

Çemê Zengemar jî li nîveka bajar re derbaz dibe û têkilî çemê Eres dibe.

Herêma Şaristana Puldeştê xwediyê seqa û av û hewayekî nîve hişk e, û zivistanên vê bê qas sar û hawînên wê jî gerim in, lê li rexê din yê sînor herêm bi tewahî çiyayî ne. Puldeşt li nav du deştên Şîblû û Zengene de cih girtiye û navê wî bajarî ji wan deştan hatiye wergirtin.

Derdora çemê Eres li daristan û qamûşan hatiye girtin ku ciwanîyekî bê qas daye wî bajarî, û ew herêm ji bo pezdaran cihekî gelek bi mifah e. Çiyayê herî bilind yê herêmê, Çiyayê Gêçe ye ku nêzîkî 1856 mêtiran bilind e.

Li çiyayên herêma Puldeştê dar û giyayên weke: Mazî, Gez, Kezan, Rêwas, lûşê, kurad û...şîn dibin.

Li wan çiyayên ku bi salane kurd li hembêz girtine, heywan û balindeyên weke: Rêwî, Gur, Kev, Teyr, Hirç û ... tînen dîtin. Li serdemê berê de li herêmê zaf Mamiz jî hebûnê, lê mixabin niha ew herêm li wan heywanan bêpar e û nifûsa wan ji nav çûne.

Puldeşt ji sê Dêhistanên bi navê

Çaybasara Rojhilat, Qereqûyû û Gêçlerat pêk tê û nêzîkî 72 gund hene. Piraniya xelkê herêmê Kurd in û bi Zaravê kurmançî dipeyvin, lê li herêmê de Azerî jî akincî ne. Kurdên herêmê pitir mijûlî pezdariyê ne û hin ji wan jî li gundên herêmê de bi karê rezdariyê mijûl in.

Seba cih girtina Puldeştê li ser sînor li sala 1371'an a Rojî li herêmê de bazarçeyekî hevpar a abûrî ji aliyê Îran û Komara Nexcewanê bi navê Seneblaxî hatiye vekirin ku rolekî bingehîn li peydakirina dahatê bo xelkê Herêmê hebûye.

Tê zanîn ku akinciyên yekemîn



Birêz Mesûd Barzanî:

“Em yek leşkerên Sûrî jî ku ji dest hêzên ertêşa Beşar Esed reviyane, radestî dewleta Îraqê nakin, û em girêdayî vê peymanê ya di navbera Îraq û Sûriyê de nînin. Her kes xwe bispêre xaka Kurdistanê emê alîkariya wan bikin û wan nadin dest dewleta Îraqê”.



Serokwezîrê Îraqê Nûrî Malikî:

“Veqetiyana Kurdan ji Îraqê zor e û xizmeta Kurdan nake. Jiber ku li piştta wan tu dewlet tuninin, lê li piştta başûrê Sûdanê dewlet hebûn. Mixabin Kurd para xwe ya petrolê jî ji Îraqê werdigrin, lê tu giringiyê nadin Îraqê. Lê berjewendiya Kurdan li vê yekê de ye ku di gel Îraqê bin û cuda nebin”.



Mihemedsalih Qadirî

Rêzdar Mihemedsalih Qadirî endamê pêşîn ê Komîteya Navendî a PDKî axavtina birêz Mesûd Barzanî weha şirove dike:

“Axavtina birêz Msûd Barzanî ji du aliyên ve balkêş e. Ya yekem ew e ku li kultura Kurdan de ne ji aliyê mirovî, ne ji aliyê exlaqî ve ji tu aliyê zordar nahê qebûlkirin ku yên ji bo rizgarkirina canê xwe hewara xwe bo wan dibin, radestî aliyên pêwendîdar bikin. Ya duyemîn jî ew e ku ew baş dizane ku renge dewleta Îraqê ku hevalbendê rejîma Sûriyê û dijî tevgera azadîxwaziya Kurd e, wan leşkerên Sûrî radestî rejîma Sûriyê bike û canê wan bikeve tirs û xeterê de. Jiber ku hikumta herêma Kurdistanê piştgiriya şoreşa gelên Sûriyê dike û naxwaze bibe hevalbendê dewleta Îraqê di warê piştgiriya ji Beşar Esed”.

Rêzdar Mihemedsalih Qadirî axavtina Malikî jî weha şirove dike: “Ew gotina Malikî nîşana tirsê bingehîn ya wî ji hişyariya netewî ya Kurdan e ku dixwazin niha pêde bi awayek rastbînane biryarê li ser qedera xwe bidin û êdî bi pîlanên tewawiyetxwazan nehên xapandin. Ew dixwaze ku bi zimanê gefxwarinê Kurdan ji her biryarek girêdayî bi qedera wan poşman bike û paşve veqetîne, lê bixwe baş jî dizane ku zimanê zorê tu bandorek li ser Kurdan tune ye û di serdemê niha de hem bîrûraya cîhana pêşketî û hem jî pêla tevgera demokrasîxaziya herêmê li her demekê zêdetir wê piştgiriya Kurdan bike.

Derbarê parê petrolê jî Malikî zimanê înkâr û veşartina rastiyan bi kar tîne, jiber ku naxwaze vê rastiye bibîne ku niha rojane zêdetir ji sedhezaz bermîlên neftê li xaka herêma Kurdistanê de tê derxistin û perê wê jî diçe budceya giştîya Îraqê de, ew jî cuda ji nefta Kerkûkê ku yek ji sê beşên nefta Îraqê bikar tîne û ew jî nefta Kurdan e. Ku wusa bû Malikî Kurdan xwedî nake, belku Malikî hem petrola Kurdan dixwe, hem jî ji gihîştina Kurdan bi mafê xwe tirs heye û naxwaze vê yekê bibîne. Bes eva Malikî ye ku bi wan kiryarên xwe rê ji bo cudabûa Herêma Kurdistanê xweş dike”.

Cihgirê pêşîn ê Wezaretê Îtîlaata rejîma Îranê Mostefa Pûrmohemedî:

“Çarçoveya karê min serbixwe û cuda ji çarçoveya karê wan kesan bû ku di dosyeya kuştinên zincîreyî di Îranê hatin tawanbarkirin, û wan kesan li jêr berpirsatiya min de kar nedikirin. Wê demê ez cihgirê Wezaretê Îtîlaatê û serokê Îtîlaata derekî a Wezaretxaneyê bûm, lê ragehandinên ser bi reformxwazan bi awayek hovane bi dijî min propagende kirin û heke min serê xwe bilind ragirtiba, wê tektîrhavêjên wan ezê kiribam armançagulleyên xwe”.



Barak Obamaserkomarê DYA'ê:

“heke hewlên me ên dîplomatîk negîjin encamê, bona ragirtina programa navkî a rejîma Îranê emê dest bi êrîşek leşkerî bi dijî rejîma Îranê bikin. Jiber ku dema em dibêjin bidestxistina çeka navkî ji aliyê rejîma Îranê ve nayê qebûl kirin, axavtin û merema me eşkere ye. Lewra heke rejîma Îranê yekalî kar bike û biryaran bide, bi vî karê xwe li hember civaka cîhanî de disekine”.



Tahir Mehmûdî

Rêzdar Tahir Mehmûdî endamê Kîmîteya Navendî a PDKî axavtina Barak Obama weha şirove dike:

“Tewaya wan biryar û reftarên civaka navnetewî li hemberî Îranê de, encama kar û kiryarên neberpirsane ên rejîma Îranê bixwe ne, ku êdî tewaya hewlên ji bo razîkirina rejîmê bê encam mane û kar gihîştîye gefxwarinên leşkerî. Pirsra

Rêzdar Tahir Mehmûdî herweha axavtina Mostefa Pûrmohemedî jî weha şirove dike:

“li gorî pêkhatiya rejîma Îranê ku pêkhatiyek îdeolojîk û daxistî ye, çawan kesek cihgirê Wezaretê Îtîlaatê be, lê agehdarê birêveçûna kuştinên zincîreyî nebe.

Di rastî de ew îdiayên weha nikarin rûyê rastîn ê rejîma wî bipeçivînin. Li dosyeya dadgeha Mîkonosê de jî me dît ku Wezaretê Îtîlaatê û berpirsyarên payebilind ên rejîma Îranê li birêvebirina vê terore de rolê sereke hebûn.

Herweha dema ku Mostefa Pûrmohemedî îdiayek weha dike hewce ye ku bêje heke wî dest di wan bûyeran de nebûye, bes yên ku dest têde hebûne çî kesaneke bûne. Bêguman tewaya hewla Pûrmohemedî xwe vedizîna ji rastiyan e, û her ew çavniheriya jî ji wan tê kirin”.

bidestxistina çeka navkî ji aliyê rejîma Îranê ve pîrsek micid e û Îsraîlê jî hest bi vê hindê kiriye lewra jî çavniherê razîbûna DYA'ê nine û bi tenê gefan li Îranê dixwe. Lê bê guman DYA li rez Îsraîlê sekiniye û Îsraîlê bi tenê nahêle û eva rejîma Îranê ye ku wê zîzarê bibîne. Bê guman heke Îsraîl bi tenê dest bê êrîşa bo ser rejîmê bike jî, hetmen bîr ji dijîkiriyara rejîmê û encamên êrîşek weha dike û em dikarin bêjin heke şer rû bide ew şer tenê di navbera Îsraîl û Îranê de nine”.

Agirî

Duheftinamêyêk siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi

Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: agiri2003@hotmail.com

agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



Selmas, gundeke herêma Şîpîranê



Îranê pileya yekemîn di bikaranîna çarşîvên reş di cîhanê de heye



Berdevka Firaksiyona Jinan di Meclîsê
Komara Îslamî de ragehand ku Îran
bikarînerê herî mezin yê Çarşîvên Reş di
Cîhanê de ye .

Lale Îftixarî, Berdevka
Firaksiyona Jinan di Meclîsê
Komara Îslamî de got: "Îran
bikarînerê herî mezin yê
çarşîvên reş di cîhanê de ye, lê
welatên Japon û Koreya başûr
jî mezintirîn berhemhînerên
çarşîvan di cîhanê de ne û
Îranê teknolojiya
berhemanîna van çarşîvan
tuneye.

Li gorî gotina navbirî,
kirîna çarşîvên reş ji derve
dibe sedema bi talanbirina
beşek zaf ji sermayeya Îranê ji
aliyê bazirganên qumaşan ve,
û dibe berpîrsên pêwendîdar
piştewaniyê ji karxaneyên
berhemanîna parçe bikin û ji
vê rewsê rizgar bikin.

çalakiyên nûkleri û nexweşiyên nedîtî li Îsfahanê



Di hinek ji bajarên Îsfahanê weke
bajarên Filawercan û Fûladşehrê de,
nexweşiyên ecêb û nedîtî hatin keşif
kirin.

Li gor vî nûçeyê
nexweşiyên ecêb hatin
ditin û zarokên wî
bajarî piştî serêşe û
verîşiyaneke zaf, û ta û
lerzê diçin nava
Komayê de, û hevdem
digel wan nexweşiyên,
hişîkbûn û jinavçûna
giyayên derdorê û
kunbûn û şewitîna
pelgên daran dikeve
berçavan.

Li gorî zanyariyan
ew yek vedigere ser
çalakiyên Etomî ên
Komara Îslamî a Îranê
li Parêzgeha Îsfahanê
de.

Taliban cejna newrozê qedexe kir



Piştî girtina 20 terorîstan ku
qesda êrîşa ser rê û resma
pêşwazî ji Newrozê hebûn, Taliban
di daxuyaniyekê de ragehand ku
ew cejn heram e.

Hêjayî basê ye ku
piştî herifandina rejîma
Taliban, her sal cejna
newrozê bi awayek
fermî tevî welatên din li
Efxanistanê de birêve
diçe û xelkê seranserê
Efxanistanê têde
beşdariyê dikin. Lê
Taliban vî merasîmê bi
kufir û heram dizane û
dixwaze ji rîya tirs û
terorê ve vî cejnê
wunda bike.

